|  Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) |  wergera ji erebî: Mustefa Reşîd |
| --- | --- |

# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 19**

## Destpêkên şaristaniyê li Kurdistanê di navber mîtologî û ayînan da

Kurdistan landik û dergûşa şaristaniyê di Rojhilata Navîn da ye. Pêşiyên Kurdan yên here destpêkê bûn, yên ku tektîkên şaristanîbûnê dahênan û afirandin, û bingehên şaristaniyê li rojavayê Asiyayê damezrandin. Em vî tiştî dibêjin ne ku em pesna xwe didin û xwe di ser gelên din ra dibînin, ne jî angaşt dikin ku Kurd "gelê Xweda yê hilbijartî" ye wek ku hin gelên din xwe dane naskirin. Lê belê ji ber wê yekê ye ku di Kurdistanê da merc û berhemên daringî hebûn, yên ku ji pêkhatina şaristaniyê ra pêwîstin. Du jêder û çavkanî vê yekê piştrast dikin: Li hêlekê mîtologiya û ayîn û li hêla din jî lêkolînên arkêologî. Emê niha di pila yekem da li ser mîtologiya û ayînan rawestin.

### Destpêkên şaristaniyê li Kurdistanê di warê mîtologî da:

Ne ji aqilmendiyê ye ku em qerf û tinaziyên xwe bi bûyerên di gotûbêjên mîtologî û ayînî da hatine, bikin. Raste ku ew pir caran li gor pîvanên aqilmendî û zanistiyê biyanî ne, ji rastiyê dûr tên xuyakirin û bi rastiyên erdnîgarî û dîrokî ra dijberî û nakokiyê peyda dikin ku kesayetiyên wan bûyeran ne asayî, belkî nîgaşî, tên xuyakirin. Lê belê di wan da pir hêma û dawerên (îşaretên) girîng hene ji bo şîrovekirina hin bûyerên dîrokî ku di heyamên kevnar da pêkhatine.

Rewşa hin bûyer û gotinên biyanî derbarê çîroka tofana mêzopotamî bi giştî û ya somerî jî bi taybetî wisa ye. Wek nimûne ku "*Ziusudra*" rêveberê *Keştiya Tofanê* (ew di gotûbêja babilî da "Utnapishtim" bi xwe ye), yê ku çîroka *Tofanê* ji *Galgamêş* ra gotiye, keştiya wî li ser kopa çiyayê "*Nisîr*" rawestiyaye; bi ser da zêde dike û dibêje:
**"Di pey ra Anlil hilkişiya ser keştiyê.**
**Bi destê min girt û ez bi xwe ra li keştiyê siwar kirim.**
**Bi min ra kebaniya min jî siwar kir û hişt ku li tenişt min here sicûdê.**
**Ew di navbera me da rawestiya, bi destên me herdiyan girt û got:**
**{Heya niha Utnapishtim tenha mirov bû.**
**Lê belê, ji niha û pêda Utnapishtim wê li ber (devê çeman) dûr be}.**
**Di pey ra ez dûr birim û li ba (devên çeman) bi cih kirim"[1].**

Gelo ev çi çemin ku bi fermana Xweda "*Anlîl*" derdora kaniyên wan ji qehremanê *Tofanê* û malbata wî ra bûn war? Em di çîroka *Tofanê* da bersiva vê pirsê nabînin. Lê belê hêma û îşaretek têda heye ku me digihîne bersivê. Di nivîseka mîxî somerî da hatiye ku xwedawend

"*Ankî*", piştî çemên Dijle û Ferat, çem tijî masî kirine[2]. Nexwe, mebest bi "çeman" Dijle, Ferat û çemên dinin yên ku ji kuntarên çiyayên Zagros hildavêjin û dawiyên wan digihîne deştên Mêzopotamiya (welatê Somer û welatê Babil). "*Zuisurda*" ji *Galgamêş* ra navê wan "çeman" negotiye, ji ber ku hem *Galgamêş* û hem jî rûniştivanên welatê Somer yên din ew çem nasdikirin; û rewşa herêmê di hizir û ramana wan da naskirî bû ku li vir bi peyva "**devê çeman**" (kaniyên çeman) îşaret pê hatiye kirin.




Gelo gotina "*Ziusudra*" tê çi maneyê dema dibêje: "**Paşê ez dûr birim û li ba devên çeman bi cih û war kirim**"?. Helbet mebesta wî kaniyên çemên Dijle û Ferat û wan çemên dinin ku ji çiyayên Zagros û herêma ku têda zincîra çiyayên Zagros û Toros digihînin hev hildavêjin. Yanê ew herême ku jêra çiyayên "Ararat" (Agirî) dibêjin. Ji bilî çemê Ferat (navê wî di nivîsên mîxî da: "Bûzartî"[3] ye) û çemê Dijle (navê wî yê somerî: "Îdgilat" û navê wî yê horî "Ernzex / Erînzax"e[4], hin çemên din jî hene wek: Çemê Aras, Zapê Mezin, Zapê Biçûk, Uzeym (navê kevin: "redanu")[5] û çemê Diyale; ev hemû ji erdnîgariya Kurdistanê hildavêjin.

Helbet, çem pir nabin heger kaniyên wan ne pir bin, û kanî jî pir nabin heger baran pir nebare û berf pir danekeve. Nayê veşartin ku hebûna berf û baranê, hebûna kanî û çeman hêmanên bingehînin ji bo jiyan û şaristaniyê; bi taybetî jî bi dîtina rûniştivanên herêmên ku baran û kaniyên wan kêmin wek deştên başûrê Îraqê. Wisa gotina *Ziusudra* "**Paşê ez dûr birim û li ba devên çeman bi cih û war kirim**" tê wê maneyê ku xwedawendan xêreka mezin pê kirine û ew di erdnîgariyeka dewlemend da, bi kanên avê û berhemên çandiniyê bi cih û war kirine. Ew erdnîgarî jî çiyayên Kurdistanê ne.

## Destpêkên şaristaniyê li Kurdistanê di warê ayînî da:

Di Tewratê da ev tişt hatiye: {**Xweda bi rojhilat da bihuştek li Aden çand û li wir Ademê ku pêk anîbû xistiyê. Xweda ji zemînê her dareka ku dilê mirov diçiyê û çeja wê xweşe têda gihand**}[6]. {**Û çemek ji Aden derdiçû ku bihuştê avbide. Ji wir beş dibû û dibûn çar**

**serî**}. Yanê çar çem: Fîşûn, Cîhûn, Hidaqil (Dijle) û Ferat. {**Û Xweda Adem bir û xiste bihuşta Aden daku têda bixebite û wê biparêze**}[7].

Daku ev gotûbêj nêzî têgihîştinê bibe, ka em wê ji şêwaza wê ya ayînî derbixin û têxin şêwaza wê ya erdnîgarî ya rast û durist. Di Tewratê da hatiye ku çemê "Fîşûn" {**ew çeme yê ku tevahiya axa El Ĥuweyle ya zêr lê heye**}, hembêz dike[8]. Û çemê "Cîĥûn" {**ewe yê ku tevahiya axa Kûş**} hembêz dike[9]. Ji ber kêmbûna agahdariyên erdnîgarî di demên kevin da, nivîskarên Tewratê çemên "Fîşûn" û "Cîĥûn" birine hin cihên nenaskirî û pir dûr ji kaniyên çemên Dijle û Ferat.

Hin zanyar hene dibînim ku herêma Huweyle (Havileh) ku çemê "Fîşûn" wê hembêz dike li bakur-rojavayê Kendava Farisî dikeve. hin zanyar jî dibînin ku herêma "Kûş" ya ku çemê "Cîĥûn" wê hembêz dike herêma "Îlamê" ye. Ev jî Kaşşiyan (pêşiyên gelê Kurd) tîne bîra me ku ew rûniştivanên kevin yên Loristanê ne (li bakurê Îlam). Hin zanyarên din jî ji wê baweriyê ne ku "Kûş" li herêma Babil (nawend û başûrê Îraqê) dikeve. Zanyarê Cihû Josephus (37-100 z.) gotiye ku "Cîĥûn" çemê Nîle û ku axa "Kûş" welatê Asyûbiya (El Ĥebeşê) ye[10].

Bi vî awayî, nivîskarên Tewratê em derbarê cihê "Fîşûn" û "Cîĥûn" sergerdan kirine. Lê belê li gor logîk û mantiqê erdnîgarî, divêt ew li wê herêmê bin, ya ku kaniyên Dijle û Ferat jê hildavêjin, yan jî li nêziya wê bin. Dr. Seyid Mehmod El Qimnî dibêje: "**Tu nikarî ti cihî bibînî ku çar çem jê hildavêjin ji bilî bilindahiyên Ermîniya... û ji van bilindahiyan herdu çemên Dijle û Ferat hildavêjin...ji wan bilindahiyan bi xwe jî herdu çemên "Kura" û "Araks" hildavêjin ku diçin ser Derya Xezer (Qezwîn)**"[11].

Wek Adeta xwe, Dr. El Qimnî xwe ji bilêvkirina navê Kurdistanê parastiye. Li me dimîne ku em bêjin "**bilindahiyên Kurdistanê**" li cihê "**bilindahiyên Ermîniya**", ji ber ku ev hemû çar çem ji erdnîgariya Kurdistanê hildavêjin. Belê pir gengaz û mimkine ku mebest ji çemê "Fîşûn" çemê "**Seyĥanê**" be, yê ku ji çiyayên Kurdistanê hildavêje, di Edenê ra derbas dibe û dikeve Derya Sipî û mebest ji çemê "Cîĥan" çemê "Cîhanê" be, yê ku ji nêziya bajarê Elbistan hildavêje, di deşta Kîlîkiya ra derbas dibe û dikeve Derya Sipî.






Heger me wisa hesiband ku bihuşta tewratî bihuşteka zemînî ye (li ser vî erdî ye), yanê li cihekî ye ku têda pir çem, dar û ber û hêmayên jiyanê hene; hîngê ji me ra tê diyarkirin ku gotûbêja tewratî tiliya xwe bi sembolîk dirêj wê erdnîgariyê dike ku di wê da zincîrên çiyayên Zagros û Toros digihînin hev (herêma çiyayê Agirî), ew herême ku dergûşa jiyan û şaristaniyê bûye. Û xistina Adem ku di wir da kar bike û wê biparêze îşaretê dide wî warê ku cara yekem jiyana mirovayetî lê xuyabûye û şaristanî lê pêkhatiye.

Cudahiya gotûbêja îslamî ji ya tewratî tenha di hin tiştên hûrik da ye. Di hin şîrovekirinên Qur'anê da hatiye: "**Xwedayê bala çar çem ji bihuştê daxistin: Seyĥan, Ceyĥan, Dijle û Ferat**"[12]. *Îmam Ehmed Bin Henbel* gotiye: "**Ji Ebi Hureyreh, ku pêximber (s.e.w.s.) gotiye: "Seyĥan û Ceyĥan, Nîl û Ferat hemû ji çemên bihuştê ne**"[13]. Di Qur'anê da li cihekî din hatiye ku Xweda ferman daye Nûh bêje, dema ew di keştiyê da bû: {**Bêje Xwedayê min, min daxîne warekî pîroz, tu xêrdarê hemû daxistiyayî**}{وَقُل رَّبِّ أَنزِلْنِي مُنزَلًا مُّبَارَكًا وَأَنتَ خَيْرُ الْمُنزِلِينَ }[14]. Di şîrovekirina vê ayetê da hatiye: "**Bereket di keştiyê da ye, rizgarî di wê da ye. Piştî derketina ji wê pirbûna nifşan û berdewamiya xêr û bereketan**"[15].

Di şîrovekirina *El Tabarî* da, di ya *El Zemexeşrî* û di ya *El Beydawî* البَيْضاوي da hatiye ku ew dara Xweda di nawenda bihuştê da çandiye û di tewratê da bi navê "**dara jiyanê**" hatiye naskirin, ew genime, yan tirî ye, yan jê hejîre[16]. Di hin şîrovekirinên Qur'anê yên din da jî hatiye ku bi Nûh ra 80 kes hebûn, nîvê wan mêr û nîvê wan jin bûn; di nav wan da hersê kurên Nûh Sam, Ĥam حام û Yafis يافِث, û ku gundê Heyştî "**gundê yekeme li ser zemînê ku piştî Tofanê hatiye avakirin",** û ku **"Nûh bavê hemû mirovane**"[17].

Wisa em dibînin ku gotûbêjên mîtologî û ayînî, her yek bi awayê xwe, wê encamê didin ku erdnîgariya Kurdistanê dergûşa yekeme ya destpêka şaristaniyê. Heger di dema Adem - bavê mirova da be, yan jî piştî Tofanê, di heyama Nûh - bavê mirovayetiyê yê duwem da be.

Helbet, em van gotûbêjan - wek ku hatine - nastînin û ne jî em angaşt dikin ku Kurdistan bi biryar ji Xweda axa pîroz bûye, li gor ku di Tewrat û Qu'anê da hatiye. Belê em jê têdigihînin ku hên ji berbanga dîrokê da, di erdnîgariya Kurdistanê da, mercên hawîrdor û heyamê peyda

bûbûn, yên ji bo ku mirov têda bijî, baş û guncaw bûn; û mimkin bû ku têda çandiniyê bi karbînin û gundan (destpêkên bajaran) avabikin.

Emê ji pêra pişrastkirina vê yekê di lêkolînên arkêologî da bibînin.

Çarşembe, 05.08.2015

## Jêder

[1] Taha Baqir: Destana Gilgamêş, rûpel 145.
[2] Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 181.
[3] Remedan Ebdeh Elî: Dîroka rojhilata nêzîk ya kevin û şaristaniyên wê, rûpl 161.
[4] Wilhelm Gernut: Horî, rûpel 116. Samî Seîd El Ehmed: Somerî û bermaya wana şaristanî; rûpel 20.
[5] Cemal Reşîd Ehmed: Xuyabûna Kurdan di dîrokê da, 1/468.
[6] Tewrat, rêwîtiya pêkhatine, Eshah 2, ayet 7-9.
[7] Tewrat, rêwîtiya pêkhatine, Eshah 2, ayet 15.
[8] Tewrat, rêwîtiya pêkhatine, Eshah 2, ayet 11.
[9] Tewrat, rêwîtiya pêkhatine, Eshah 2, ayet 13.
[10] Keşe Samuel Yûsif Xelîl, dergeha ketina heyama kevin, rûpel 105.
[11] Seyid Mehmod El- Qîmnî: Pêximber Îbrahîm û dîroka nenaskirî, rûpel 75.
[12] Şîrovekirina Şem'anî, 3/468. Şîrovekirina El Qurtubî, 13/104. Şîrovekirina El Bexewî, 5/413.
[13] Musned Ehmed Bin Henbel, çapa El Risaleh, 13/268.
[14] Sûreyî El Mu'minûn, ayet 10.
[15] Şîrovekirina El Nesfî, 2/466.
[16] Şîrovekirina El Tabarî, 1/519. Şîrovekirina El Zemxeşrî, 1/127. Şîrovekirina El Beydawî, 1/72. binêr li Şîrovekirina El Nesfî, 1/81. Şîrovekirina El Alûsî, 2/427.
[17] Şîrovekirina El Tabarî, 15/326. Şîrovekirina El Semerqendî, 2/154. Şîrovekirina El Şûkanî, 2/566. Yaqot El Hemewî: Ferhenga welatan, 2/84.